Pîrozbahî

Bi hatina cejna sersalê, ez sala nû li we pîroz dikim, bi omîd û hêvî me ku sala 2006-an sala serbestî, wekhevî û azadiyê be.

Bêgumane ku, mirov bi hemî nijad, ziman û olên xwe ve, mafên wan di jiyaneke sebest û bi rûmet de heye, û gereke, tu hêz, tu destelat, tu mirov nikaribe mirovan ser rûçikê vê gerdûne şermezar û riswa bike, wan ji mafên wan bêpar bike. Ango, bi kurtî, gereke tu mirov çavsoriyê li birayê xwe yê mirov neke, ji ber ku dema hiner û zor dij mirovan hate bikaranîn, yasaya dehlê tête pê, kesê xurt û bi hêz dê yê sifîl daqurtîne....!!Bi vî hawî, jiyana ademîzadiyê ser vê zemînê berdewam nabe!!...

Ez bi hêvî me ku sala me ya nû, sala mirov û mirovatiyê be, sala aştî, xweşî û şahiyê be.

Careke din, sersala we, ya gelê me û ya hemî cîhanê pîroz be!!

B.Dara
Qamişlo

Kurte wêneyên ji sala borî

Hesenê Cûmî

Havîne, tîngtînga kurmê Temûzê ye, stûnê toz û telazê gihaye taqê heftan. Di navbera herdu çemên Decle û Ferat de, qîreqîrqa dayîk û zarokane. xwîna sor û germ di kolanên bajar û gundan re diherike, dibe lehî, tevle ava herdu çeman dibe. Bi navê Xwedayê pîroz, serê mirovan tên jêkirin, otombîlên teqînê, li her deverê diteqin, laşên pîrek, zarok, pêremêr û pêrejin dibin parî û li her deverê balavdin. Di rojên pîroz de, Mizgeft, Kenîseyên Xuristiyan û civatên serxweşiyê, diteqin, bi sedan mirov têne kuştin. wêneya xwînê di jiyana wan de, bûye tabloya Cokinda?!.

Rojnemevan û xwediyên peyva azad jî, ji şerê wan hovan ne bêparin. Di sala borî de, derdora 63 rojnemevanan têne kuştin. Ji nav wan, **Semîr Qesîr**, û xwediyê peyva bi nav û deng (**Cudabûna di navbera tarî û ronahiyê de peyv e**) **Cubran Tiwênî** bi otombîlên teqîn tên kuştin.

Li welatê me, her diçe, bivên derve gur dibin. Lê, ta nuha zagonên awerte berdewamin. Kesên di bin xêza birçîbûnê de dijîn, her û her pirdibin û diz û hov jî har û gur dibin. Lwere jî, mafên mirovan tên binpêkirin. Gelo : Ev mirovê ji hemî mafên mirovatî bêpar, kane li pêş wan bivan bisekine?!.